Mele Zahidê Diyarbekrî

# HERDÛBAT

Stockholm 1990

Mele Zahidê Diyarbekrî

# HERDUBAT

Wergêr ji tîpên Erebî:
Zeynelabidîn ZINAR

Weşanên Apec-tryck & Förlag

**HERDÛBAT**

**Weşan no:** 7

**Utgivare:** Apec-Tryck & Förlag
Box 3318
163 03 SPÅNGA
**Tel.** 08-761 81 18

ISBN : **91 87730 18 - 9**

# PÊŞGOTIN

Nivîskarê hêja mele Zahid di sala 1935 ande li gundê Dêrsilê hatîye dinê. Navê bavê wî mele Hadîyê kurê mele Mihemedê Endarî ye. Gund nêzî bajarê Hezroyê (Dîyarbekir) ye. Ew 7-8 salî bûye diya wî mirîye û dest bi xwendina medresê kirîye. Mele Zahid di despêkê de li gundê Başnîqê li nik mele Remezan xwendîye. Di pey de li nik mele Ehmedê miftîyê Farqînê û paşê li nik şêx Mihemed Seîdê Cizîrî domandîye. Ewî di demekê de li Kurdistana Sûrîyê, li bajarê Amûdê û li Xeznayê jî xwendîye. Di paşîyê de mele Zahid destûrnama xwe ya xwendinê ji şêx Ûsivê Sewrî (Mêrdîn) sitendîye. Nivîskar piştî ku dibe mele,ji sala 1959 an hetanî sala 1969 an, li bajarê Licê di xwendegehê de dersa feqîyan daye.

Mele Zahid, hozan û nivîskarê bi nav û deng û kevintirînê nivîskarê Kurdan mamosteyê nemir mele Ehmedê (Hiseyn) Bateyî bo xwe kirîye pêşîwar û mewlûda wî qopye kirîye,bi zimanekî xwirî Kurmancî ji nû ve nivîsîye. Û wî bixwe bi navê HERDUBAT jî navdar kirîye. Di malikeka wê de weha dibêje:

"Seydayê Batê digel vî Zahidî
Pesnê Mewlûdê bi Kurmancî didî"

Ev berhem jî, mîna Mewlûda Batê her du rêz bi yek qafîyeyê ne û li ser yazdeh kiteyan honayî ne. Lê belê di navbera herdukan de guhartineke cuda dikeve ber çavan. Bes cî cîna hin rêzên Batê,mîna jêderkan,tê de xwîya dibin.

Li gor agahdarîya ku mele Zahid di paşîya pirtûka xwe de bi zarê Erebî kirîy: Ewî vê Mewlûdê di sala 1973 an de li bajarê Dîyarbekir nivîsîye. Û bi alîkarîya Ehmed T. di sala 1978 an de jî, li Stenbolê di çapxana "Bayraktar" de bi wênekêşîya destxetên wî li çapê ketîye. De lê belê nivîskar di rêzekê de weha gotîye:

"Bû hezar û heyştê û çar sêsed e". Îcar ev tarîx ku ya hicrî be 1384 e. Beramberî ya mîladî dike 1964-1965. Ji vê yekê tê zanîn,her çiqas ku wî gotîye : "... di sala 1973"an de nivîsîye,belkî di vê tarîxa li jor de nivîsîbe

Mewlûda Batê, ew çapa ku me wergerandibû latînî û ROJA NÛ jî çap kiribû,19 beş in û 565 beyt in. Lê belê ev mewlûd 22 beş in û 667 beyt in. Lê digel beyta tekrar a di dawîya hemû beşan de,tev 689 in.

Nusxeyek ji vê Mewlûda çapbûyî,bi alîkarîya kurdekî welatparêz -bi navê Hecî- giha destên me. Me jî ew ji tîpên Erebî wergerande Latînî û pêşkêşî xwendevanan kir. Hêvîdar im ku wê ji zimanê Kurdî re bi xêr be û wê pirtûkxana Kurdistanê jî pê dewlementir bibe. 15. 06. 1988

**Zeynelabidîn**

# BEŞ 1

## MEWLÛDA ŞERÎF HERDUBAT

## Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm

Pesnê pir bona Xwedayê alemîn
Ew Xwedayê daye me pir keremîn

Em kirine umetek b'xêr û ber e
Pêgirtyê wî Muhemmed Peyxember e

Ew Xwedayê xweyê mulkê pir mezin
Me musulman kirye tev hev mêr û jin

Daye me îman bi Qurana şêrîn
Em kirne ummeta Muhemmed emîn

Ew Xwedayê fena wî qet kes nehin
Bê dêk û bav û heval bê mêr û jin

Bê vexwar û xwarin û bê cî,mekan
Em ji bona cî dibêjin "Lamekan"

Erd û esman û temamê aleman
Xaliqê gişkan Xweda ye bêguman

Xwarinê b'hemyan dide ta mar û mûr
Kurmikê nava kevir bin behra kûr

Pir delal û esbehî me çêkirî
L'piştî me cinn û melek wî xweş kirî

Wexta em rabin biçine cennetê
Dê melek bikne ji bo me xizmetê

Gemîya erdê ji bo me çêkirî
Kitêbê nazik ji bo me rêkirî

Pêş,berî me Muhemmedê esmerî
Gera erd û asîmanan tev kirî

Em li dora erd û esman bigerin
Hikmetê mezin ji xwa em bigirin

Lazime em ku bibînin sin'etê
Xaliqê xwe jê bibînin 'ibretê

Gava em çav bidne hinkê aleman
Heq bidin secde ji bona aliman

Şopa Rebbê 'izzetê d'me pirtir in
Lew benîadem ji her kes çêtir in

Hêvîdar in em ji te şahê kerîm
Tu me bî li ser riya rast û selîm

Em gunahkar in hemî qûlê te ne
Hêvîdarê rehm û îhsana te ne

Ya Reb îmanê dixwazin em mudam
B'kevin bin kona Muhemmed we'sselam

Ey Muhemmed em bi heyrana te ne
Gişkî xelqê aleman l'benda te ne

Tu ji bona me,temamê alemê
Piştemêrek xweş di roja teng demê

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 2

## PESINDAYÎNA PÊXEMBER
## Û XÊRA MEWLÛDÊ

J'bo te ra bit her zeman û gav û hîn
Ey Muhemmed bi hezaran aferîn

Ey resûlullah resûlê Qureyşî
Ey hebîbê weku nûr jê dikişî

Zahidê bê çar di vê dewrê heye
Ger qebûl kî bulbulê işqa te ye

Ey şefî'ê feqîrê vê ummetê
Destê me bigrî di roja zehmetê

Kes di tarîxê dinê wek te nebû
Li dinê wek te kesek mwefeq nebû

Pir mubarek be li te peyxemberî
Tu ji bo vê alemê ra rehber î

Pir selat û pir selam me li te ye
Çi bibêjim sebra me b'navê te ye

Piştemêrê me di roja ceng tu yî
Destekêşê me di roja teng tu yî

Pur mezin rutbe Xwedê daye bi te
Pir ezîz bûyî ku bawer kir bi te

Tu çira û ruhnîya heft asîman
Herdu alem ra tu yî ruh û rewan

Hatina te pir şeref da ummetan
Kurd û Tirk û Ereb û van Eceman

Her çîyê nûra te dîtî bû fîda
Mal û canê xwe d'wê rêkê d'da fîda

J'xatirê nûra te ye Buyt-ul Heram
Lew me nas kir Zemzem û Rukn û Meqam

Em diçin ferzê xwe pê tînin bi cî
Hem gunahê me diçe hem d'bin hecî

Piştemêrê me temamê ummetê
Dê bi saya te biçin em cenetê

Ayeta ku "Maremeyte" behs dikit
Îşê te tevlû Xweda peyvê dikit

Sî cuzwê Quranê tev da ku hene
Mûcîzat in tev keramatê te ne

Dengê azanê li ser deşt û çîya
Te gihandîye bi xelqê hemîya

Tornê Îbrahîmê Beytê çêkirî
Wî j'işqa te kurê xwe qurban kirî

Pir selamê me li ber bejna te ne
Aşiq im heyran û qurbana te ne

Agirê qelbê me tê j'işqa Resûl
Ustuxwar in em ji wê bûne melûl

Tîrêja nûra te ye bûye xwiya
L'Tûrê Seynayê çîyay Mûsa biya

Pir selatê me li ser nûra te bin
Roja heşrê em di nav bîra te bin

Bê jimar me pir hene gnahê mezin
Lê me hêvî em di bin darê te bin

Tu ji bona me temamê ummetê
Piştemêr î xweş di roja zehmetê

Ey Muhemmed em bi heyrana te ne
B'mal û canê xwe b'qurbana te ne

Tu ji bona me temamê ummetê
Piştemêr î xweş di roja zehmetê

Alema îslamê tevda ku heye
Giş minetkarê evî dînê te ye

Dê bi saya te Xwedê rehmê bike
Wan gunahê me hemî 'efwê bike

Roja heşrê em bi bal te dê werin
Bi cenneta e'la b'saya te herin

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 3

## HURMETKIRINA MEWLÛDÊ ADETKIRINA WÊ

Çi kes guhê xwe b'dî Mewlûda Nebî
Derîyê mizgînîyan dê lê vebî

Ji me ra got Peyxemberê pir b'qîmet:
"Mewlûda min çi kesê qedir biket

Salê carek ew ji bona min bide
Deftera zêrîn bi destê min dide

Dê nivîsînim di nav wan defteran
Dê heval be ew di nav peyxemberan

Ez şefî'ê wî me roja mehşerê
Dê vexwut ew taskî ava Kewserê

Serf bike l'mewlûda min ew yek pere
Her wekî serfa çîya zêrê zer e

Ji bo hubba min gazî b'ke her kesî
Ferq neke nava Elî,Welî,Weysî

Feqîr û zengîn temam gazî bike
Qederê kare ji xwa hazir bike

Di meha ewil da Rebî'ê da bibe
Xêra wê dê ji her meh pirtir bibe"

Yan d' meha nîsanê da dê wer bidî
Mewlûdek bona hebîbê xwe bidî

Zarik û mêr û jin û kal û cuwan
Keyf bikin j'bona hebîbê xwe wusan

Bi şemala agir wek mom û fener
Bi şerbet û bihna xweş pir muteber

Tev û hev rabin piya guh bidinê
Sankî ev gav e ku hatî vê dinê

Hinkî nan û xwê d'gel te'mê xwe tev
Bidin ber vê xwendina ew tevlû hev

Herçî tiştê hûn bidin ber xwarinê
Dê mubarek be ji xwa guh bidinê

Hem selatan bidin hem keyfê bikin
Qelbê zarûk û feqîran şa bikin

Çi kesê ev îş bike seransere
Bide xwendin Mewlûda Pêxember e

Xwe digîjîne siya Peyxemberan
Hem rica kare bike j'bona piran

Ew diçe heşrê digel xelqê temîz
Tevlû wan peyxemberanê pir 'ezîz

Ji Ebûbekr û 'Umer Mewlûd bûye
Hem ji Osman û Elî ev çê bûye

Fexrê Razî tevlû hinkî aliman
Pesnê Mewlûdê didin b'çend gotinan:

"Yek qurûşkî serfê Mewlûda Nebî
Xeyrekî mezin ji bo hasil dibî

Her cîyê tê bête xwendin rehme lê
Dê melek bên û tijî wê menzilê

Xanîyê mewlûd di wî bête kirin
Dê bela hemî ji wî def' bê kirin

Xwedîyê zad û civata wî temam
Dê melaîket li wan bînin selam

L'ba melekan qedrê wî pirtir heye
Xatirê wî d'qebra tarî pir heye"

Piştî Peyxember bi sed salê zeman
Walîyê Misrê diday qedrek temam:

Çil hezar pez û deve serjê kirî
Çar qasê wî mirîşk û qaz sor kirî

Tev ji bona Mewlûda Pêxember e
Malê xwe dida ew j'nav hatî der e

Ya Rebbî tu me 'efû kî tevlû hev
L'dor hebîbê te Muhemmed bibne sef

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 4

## BEHSA XULQA HEZRETÎ MUHEMMED
## Û QALKIRINA ÇÊKIRINA KAÎNATAN s. e. s.

Em di vê feslê bikin behsa Hebîb
Çer Xwedê çêkir ewî rindê necîb:

Hinkî nûrê girt ji nûra xwe Xweda
J'wê ra got:"Bib hebîbê Muhemmeda"

Hêj tunebû 'erş û kursî yû qelem
Erd û esman û melaîk muhterem

Wexta emrê wê kirî,bû teyrekî
L'ser qefeskê sekinî tesbîh dikî

Sed û bîst û çar hezar sal d'wê dima
Daîma tesbîh dixwendî j'bo Xweda

Piştî van dewr û zemanê buhurîn
Daye pê dozde sîfatê enwerîn

Em ji bona we bibêjin wan temam
Tev li pey hev bijmêrin bînin kelam:

Qudret û Meznatî yû Merhemet in
Minnet û Başîtî yû Keramet in

Rutbe û Hîdayet û Peyxemberî
Ta'et û Şefa'et û Xweşribserî

D'van sîfatan da gelek ew sekinî
Bi hezaran sal diçû tê mekinî

D'her yekê da ew dima d'behra xwe da
Her nezergaha Xweda lê bû cuda

Piştî van girtî Xwedayê îns û cin
Wê nûrê avêtî çar behrê mezin

Behra Nusret ya dinê Merhemt e
Herduwê dî Qudret û Marîfet e

Marîfeta Xwedê weqta hat bi ser
Helîya nuqtuk ji wê hatin bi der:

Sed û bîst û çar hezar nuqtik rijan
Her yek bû peyxemberê qewmê nezan

Piştî van,çêkir ji vê nûra zelal
Cewherek,lê kir nezer ew bû delal

Bû du felq ewya ji ber 'ezemetê
Lê tecella kir celala 'izzetê

Nîva ewel da ber çavê heybetê
Nîva dinê da ber çavê şefqetê

Ji celala 'izzetê nîvê ewel
Helîya,bû behrekî mezin bi kel

Pir hezar sal kelîya hişkî dibû
Fetiqî,jê erd û esman çêdibû

Fitiqî perçe bi milyon jê dibû
Her perçê wê alemek jê çêdibû

Her alemek bi tewrek bûye cuda
Bi hezaran tê heye neqşê Xweda

Hef(t) tebeqê erd û heftê asîman
Jê bû,melek û cinn û însan diman

Alema istêrka tev hev ku heye
Yek tebeqkî j'wan heft-i nêzê me ye

Piştî erd û asîmanan tê bi der
Alemê ku me ji wan nînin xeber

Gişkê van aleman tê j'nîvê ewil
Çê bûye,em nikarin bînin 'eqil

Em di nav vî nîvî giş ku bigerin
Dê li me dewr û zeman pir buhurin

Lê bi vî 'umrê kinik ê bê eman
Seyr bikin em dê li hinkê aleman

B'hikmetê mezin emê çav bidirin
Îbretê mezin emê dê bigirin

Gava em çav bidne hinkî 'aleman
Dê qebûl kin gotinê peyxemberan

Em evî nîvî li vir bêlin,werin
Behs bikin j'nîvê dinê kurt bibirin

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 5

## QALKIRINA 'ERŞ Û KURSÎ Û QELEM

Ji nîvka dî çar-i tişt bûne cuda
'Erş û Kursî yû Qelem,Lewhê Xweda

Vî nîvî ji nîvê din ra hakim e
Terz û îdare bi vî tim û tim e

Hate emrek j'padîşahê pir mezin
Xaliqê alem Xwedayê îns û cin:

"Ya Qelem binvîs bi emrê padîşah!"
"Çi binvîsim ez bi ferman ya Îlah?"

Got:"Binvîsin laîlahe îllellah
Hem li pey wê Muhemmed resûlullah"

Kete secdê ew qelem sed sal zeman
Ser bilind kir got:"Îlahî el eman!

Ez dizanim kes tune îlla tu yî
J'xeyrî te me'bûd tune her we tu yî

Pir meraq bûye ji ma bawer bike
Li qusûrê tê ji min,mêze meke

Ew kî ye ku navê wî b'navê te re
Pir bilind e l'cem te pir muteber e?"

Xaliqê alem digotê:"Ya Qelem!
Tu nivîs ke,te şuxul nîne ji cem!

Tev kitêbê min ji wî behsê dike
Eynî nûra min di wî xuya dike

Erd û esman û temamê îns û cin
Min ji bona xatirê wî çêkirin

Herçîyê j'wî hes bike,j'min hes dike
Ew cîyê xwe l'cenneta şêrîn dike

Tu ji bonay hatiyî bo wî Qelem!
Tu ji işqa wî binivsîn dem bi dem"

Işq û mihbetê Qelemê şeq dikir
Hat li ser lewha nivîsanê dikir

Ji ewilê nivsandina wê digot:
"Ey Muhemmed te dilê min pir disot!

Ya Muhemmed pir selamê min l'te ne
Gerçî nava min û te pir sal hene!"

Da cewaba Qelem,Rebbê izzetê:
"We eleyke esselam û rehmetê"

Lew "Selam" bûye sunnet j'bona me ra
Redda wê ferz e,ji bo xwişk û bira

Qelemê nivsand temamê alemê
Herçî borîn,herçî bêtin l'vê demê

Qedera tiştan hemî nivsan kirî
Lê bû wesfê ne bi fê'la tam kirî

Wê nivîsî yê gunahkarî bibin
Şubhe nîne yê di nav agir bibin

Yê xwe baş kin dê bibînin ni'metê
Keyf û zewqê dê bibînin l'cennetê

Ummeta Muhemmed hemî b'xêr-ber e
Ehlê nûr e,l'cem Xwedê mu'teber e

Dê 'efû ke warisê peyxemberan
Herçî mayî dê bide ber xatiran

Ger dixwazin hûn xelas bin ji agir
Selewatan bînin herçîyê hazir

## BEŞ 6

### QALKIRINA NÛRA PEYXEMBER Û ÇÊKIRINA BAVÊ ME ADEM ess.

Piştî xulqa kaînatan bû wusan:
Gelkî borî li dinê dewr û zeman

Bê hîsab mexlûq li ser erdê diçin
Ehlê tarîxan ji vê hay jê tunin

Berya însana bi gelkî pir zeman
Hinkî mexlûq hatine erdê wusan

Ew jî wek însana eqlê wan hebûn
Ray û tedbîra dinê hey jê hebûn

Paşê fitne,kuştinê wan çêkirin
Rebbê alem wan j'dinê wendakirin

Paş,sira hat Ademê bavê beşer
Nazikê xweşqametê şêrînşeker

Rebbê alem emrê Cibrîlî kirî
Hate dinyayê ji vir axê birî

Got:"Ezê çêkim yekî d'dewsa xwe da
L'ser rûyê erdê bibe d'emrê me da"

Girt û tevda eciland kirye hevîr
Hem bi ava qudretê hem da bi şîr

Çêkirî Adem bi destê Qudretê
Danî nav baxçe di nava cennetê

Paşî emrê Cibraîl kirye Xweda:
"Gazî ke tevlû melekan ev nîda:

Hûn werin l'Adem ji xwa mêze bikin
Hurmeta Xaliq ji boy secde bikin"

Giş melek hatin li wî mêzekirin
Heyirîn bo qametay 'îbret kirin

Herdu çav û herdu dest,herdu nigan
Dane ber hev Xaliqê erd û seman

Qameta dirêj ku ruh tê bibiya
Dê li ser herdu nigan rabe piya

J' sin'etê Xaliq temamî heyirîn
Tev û hev rabûn ji boy secde kirin

Melekê Tawis d'wê xwe şeytan kirî
Xwe qure kir secde j'bo wî nebirî

Fam nekir,secde ji bona Xaliq e
Ebedî j'rehma Xwedê bû fariq e

Piştî vê ra ruh ketê rabû piya
Melek û cennet li wî bûne xwîya

Ewwelê peyva wî "elhemdu" digot.
"Yerhemukellah" Xweda j'bo wî digot

D'pişta wî nûra Muhemmed bû xuyan
Lew melek hatin li pey wî civîyan

Goti Adem:"Ev melaîk çi dikin
Têne pişta min li çi mêze dikin?"

Rebbê alem gote Adem:"Xweşik î
Tu ji bo nûra Muhemmed eynik î

Ew hebîbê min di pişta te xuyan
Lew melek hatin li pey te civîyan"

Gotî Adem:"Ya Rebbî,min pir divê
Nûr ji piştam bête pêşyam,min li vê

Ezê lê mêze bikim keyfxweş bibim
Wek gula av lê bibe,rûgeş bibim"

Emr û fermana Xwedê lê tebitî
Nûr ji piştay hate pêşya wî ketî

Hin dibêjin,"hate tilya eşedê"
Adem lê heyirî bi çavê xwe dî

Tevlû nûra eshaba nûra mezin
Hat û dest û tilyê Adem daketin

Ya Ebûbekir di tilya ortê ket.
Ya li pey wî nûra 'Umer pêdiket.

Ya piçûçik nûra Osman tê dibû.
Pêçîya mezin Elî lê heldibû

Tilyê Adem tev şemal û nûr dibû
Lê dinêrî ew bi wê keyfxweş dibû

Hat diya Hewa li wî mêze dikir
Ew jî wek Adem bi wê pir keyf dikir

Gote:"Ya Adem!çi nûr e bû nesîb
Ez û tu,melek bi wê mane 'ecîb?"

Adem got:"Nûra resûlek mazin e
L'pişt me tê,peyxemberê nesla min e"

L'pey vêya Adem û Hewa l'cenetê
J'xeyrî darê jê dixwin her ni'metê

Emr û fermana Xwedê dara genim
L'wan heram e,"nêzîkî wê hûn nebin"

Şeytanê mel'un bi wan ra çû bin e
Firseta xwe dî bi wan da xwarin e

Herduwan jê xwarin û 'asî dibûn
Cilê ser wan çû li wê tazî dibûn

Weqta bêemrî ji Adem çêdibû
Nûr ji pêşyay hate piştay sî dibû

Bû gunah,karê bi hev ra ketinê
J'cenetê avêtine rûyê dinê

Yek li Hindê,yek li Çînê daketin
Li ser rûyê erdê b'hev ra ew ketin

Tazî yû bêçare herdu pir girîn
L'ser rûyê erdê gelek salan gerîn

Ehlê tarîx û kitêban wer dibên:
"Li ser grê wê Erefatê hev didîn"

Piştî vêra ew dibûne mêr û jin
Em benîadem ji nesla wan dibin

Rojekê ew ket sicûdê pir girî
Ser bilin kir hem li jor mêzekirî

Perde rabû,dî temamê asîman
Lê xuya kir ta bigîje Lamekan

Dît di çaqa 'Erş da lewhek çêbûye
Di rêzik tê da nivîsandin bûye

Rêza ewel:"Laîlahe îllellah"
Ya dinê "Muhemmed resûlullah"

Got:"Bi heqê wî Muhemmed tu bikî
Ademê bêçar di 'efwa xwe bikî"

Hate xwarê Cibraîl wê saetê
J'Ademî ra 'efwa Rebbê 'izzetê:

"Rabe ser xwe Ademo!efwa Xwedê
Ji bo te hat,rabe guhê xwe bidê

J'xatirê navê Muhemmed ew resûl
Wê ricaya te şihandî,bû qebûl!"

Ey cemaet tev û hev tewbe bikin
Hûn bi saya wî ricaya xwe bikin

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

## BEŞ 7

### JIMARTINA BAV Û KALÊ PÊXEMBER Û CIYÊ WAN

Piştî Adem çû ji dinyê mirîya
Nûr di pişta gelk mirovan gerîya

Kete zik û pişta kî,ew pîs nebû
Qet gunehkarî l'dinê jê çê nebû

Bi jimarê ta bi Adem em bibên
Belkî bav û kalê wî em kêm bibên:

Lê (ji) Şîs heta bi Îbrahîmxelîl
Bav û kalê wî dibûne Kurd celîl

Lê j'Urfayê diçû Îbrahîmxelîl
Di Hîcazê sekinî l'wê bû delîl

L'piştî Îbrahîm ku Îsmaîl dibû
L'nav Ereb bû,ew jî wê ereb dibû

Ta nebîyê me Muhemmed ew dihat
Silsila wî bû Ereb j'vir dihat

Ew ji Ednan ta bi Ebdullah gihîşt
Bîst û yek bav ereb in rast û durust

Em ji bona we bibêjin wan temam
Bîst û yek bavan bidin rêza kelam:

Ji ewel,Ednan û Me'd in ey bira!
Li Nezar û Mudr û Ilyas tê sira

Mudrîke pişt wî Xezeym e taze eyş
Hem Kenan e piştî wî Nedrê Qureyş

Ji vî Qureyşî dibûne Qureyşî
Ta Muhemmed ew bi vî navî kişî

L'pey vana Malik û Fehr û Xalib in
Ke'b û Murre hem Qusey û Kîlab in

Hem ji pişta wî Quseyê pak û saf
Ew emanet hate nik Ebdulmenaf

Hem ji nik Ebdulmenafê pir delal
Hate pişta Haşim ew nûra zelal

Hem ji Haşim ew emanet radibû
Hat bi Ebdulmuttelib mêvan dibû

Silsila wî ta bi Adem da û bab
Dê biçîtin cennetê tev bê hîsab

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 8

## ŞORKIRINA KERAMATÊ BAVÊ PÊXEMBER DIGEL CENGA YAHÛDÎYAN

Hem ji Ebdulmuttelib û Fatîmê
Çêbû Ebdullahê şêr ê (wê) demê

Nûr di enya wî gelek şûle dida
Çi kesê ew bidya ber pê xwe dida

Hêlîna nûra Muhemmed hatî ew
Pak û nûranî delalî hatî ew

Weqta Yehya kuştibûn Yahûdîyan
Xwîna wî kirne Cubê nav hirîyan

Gotin:"Weqta xwûn bibe şil û ter e
Yê ku heyfa wî bistînit dê were"

Hişk dibû ew xwîn di kûban bû kemar
Ta ku hatî Ebdullahê namîdar

Taze bû ew xwîn ji Cubbe herikand
Rahib û Yahûdîyan guh pelikand

Welwele çêbû li ser wan hakiman
Xelqê Şamê tev diçûn ber rahiban

Teze bû ew xwîn ji Cubbe herikî
Rahiban got:"Ayî wayî! em çi dikî?

Nêz e rabe Mehmedê sahib kerem
Wenda ke Tewrat û Incîl û senem

Hat xwedanê şûr û Qurana mubîn
Xwîna Yehya va nîşana wî yeqîn"

Ramilan remlê xwe dane ber qelem
Got:"Ewê rabe ji nav xelqê senem"

Wan yeqîn kir dê di Mekkê da bibe
Lewra tev pût û senem d'wê da dibe

J'bo vêya heftê cihûd rabûn ji Şam
Bi hev ra xwarin sondê, sozê d'temam:

"Ta nekujin em ewî xortê bi nûr
Yek ji me nayê bi Şamê j'axa dûr"

Tev hemî xwînxwar û zalim dil bi kul
Wan berê xwe da Mekê b'hêrs û bi sil

L' ser riya xwe pirs d'kirin jî rahiban
J'kê d'pirsîn Mekê bo wan nîşan didan

Zû gehîştin çûne dora Mekkehê
Xwe d'veşartin fena ava bin kehê

Da binê kengê bibînin firsetê
Şev û rojan diguhurin newbetê

Piştî pirsîn,nas kirin wan Ebdulla
Lê d'Mekê da wî heye qewmek bela

Gotin:"Qenc e em bibînin wî li der
Wê demê dê bikujin em b' şûr û kêr

Rojekê wan dî bi çolê da meşî
Seyd û nêçîra xezalê çavreşî

Wan  dî rabû Ebdullahî bê guman
Bi tenê tenha bi çolê bû rewan

Firseta xwe dîn li pey wî tev diçûn
Bi xezeb tev fena gurê devbixwûn

Eynî wê rojê li seydê bû Weheb
Bavê Amînê ewê baş ê b'edeb

Dî ku hatin Ebdullah qewmê Cuhûd
Şûr di dest wan,Ebdullah ma bê umûd

Lê Qureyşî tev û hev mêrxas-cesûr
Edullah halan dida rakirye şûr

Hate dengek:"Ey Cuhû hûn terk bidin
Hûn li bavê min nikarin dest bidin"

Nûr ji pişta Ebdullah hatî bi der
Şewq û qêrînek li wan daye bi ser

Agirek hatî Cihûd şewtan kirin
Wan ji ser rûyê dinê wenda kirin

Bavê Amînê kete şerm û fedî
Surê Ebdullah li ber çavê xwe dî

Wî didîtî j'Ebdullah ev sir û hal
Kete qelbê wî,nivîsî ev xeyal:

"Ger qebûl ke,daye pê min Amîne
Min keçek pak û delal û sakîn e"

Hatî malê ew Weheb pir ecele
Kete qelbê wî şewat û welwele

Herçî wê rojê ku guhdarî kirî
J'Amînê w malya xwe ra behsê kirî

Piştî dîtî ev keramat û 'eceb
Ji malya xwe ra wer digot wî Weheb:

"Ey keçê,min vê tu qasid bî ji min
Rabe here Xanedana malmezin

Bêje Ebdulmuttelib ra:'Tu were
Em bidin te Amîna pir dîlber e

Amîna min layîqê la(w)ê te ye
Em bidin pê,dilê me pir tê heye

Pir delal û nazik û d'weqta hev in
Herdu rind layîq û hukûfê hev in"

Ebdullah xortê delal î şekerî
Nûra Ehmed kirîbû wî enwerî

Sekl û sîma fena hîva asîman
Nazik û pir rind ji mala Xanedan

Xweşik û rind û delal û wek şeker
Çi kesê ew bidya,dil lê bû dîger

Dîlberê qîz ê Qureyşan û Ereb
Hêvîdar bûn tev ji bo wî roj û şev

Tev û hev dilê di wan tê da hebû
Lê dilê wî bi yekê qet çê nebû

Lewra nûra Pêxember d'enya wî bû
Ew bi saya wê nûrê şêrîn dibû

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 9

## DÎTINA BAVÊ PÊXEMBER
## 'ECAÎB (JI) KERAMATAN

Rojekê wî gote:"Babvo,ya emîr!
Çi gava ez biçme çolê j'bo nêçîr

Tê ji pişta min bi der nûrek mezin
Radibîte ser serê min ew ji min

Piştî radbe ser serê min d'be du ker
Yek di Şerqê yek di Xerbê diçe der

Ez dibînim dîsa tê ser hev bi min
Radibîte ser serê min ew ji min

Radibe bilind dibe,berjor diçe
Şewq û reng û xweş şemalek jê diçe

Ez dibînim asîman bûye du şeq
Radibe ew dibore di heft tebeq

L'asîmana gelkî tişt xuya dikin
Giş melaîket li wê selam dikin

Saeta ez biçme çolê bi tenê
Pir 'ecaîb têne pêş min wê demê

Hem ji erdê tête guh min ev kelam:
'Way digel te nûra Ehmed ya zilam!'

Her çi dara hişk be ez biçme binî
Dibe heşîn ez ji belgan bûm xenî

Di be sî w sîwan li ser min xemilî
Ez diçim dibe hişk bê belg û gulî

Teyr û heywanat bi min heyrê dikin
Tev li pişt min kom dibin seyrê dikin

Kanîya zuwa be ez biçme bi ser
Şil dibe wê gavê,av jê tê bi der

Weqta germê tête ser min ewrekî
Sî dide ser min,li min honik dikî

Dar û ber û kevir û pîj û qelam
Ku diborim tev li min dikne selam

Di xewê da ez bi teyrek difirim
Erd û asmanan temaman digerim

Ev çi hal û reng in,bavo bêje min?"
Bavê wî got:"Ruhnîya çavê di min

Keyf bike,mizgîn li te be,ey şêrîn
Dê ji te zahir bitin şahê emîn

Dê mirovek pir mezin j'te rabibe
Feqîr û bêçar bi wî tev şa bibe

Hêvîya min her ev e dê wer bitin
Rehberê alem ji te peyda bitin

Min gelek xewna dîye dê wer bibe
Ey delalê min ji xwe deng qe nebe"

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 10

## ZEWCANDINA BAVÊ PÊXEMBER EBDULLAH Û HEZRETÎ AMÎNE

Piştî van peyv û xeberdanê me got
Cîger û can û dilê Weheb disot

Hanî Amînê gelek xweş xemiland
Qasidê xwestinê bona wan şihand

Hat bi Ebdulmuttelib behsê kirî
Hem bi Ebdullah gelek şêrîn kirî

Ebdullah got:"Rabe dayê,pir delal
Tu bibîne Amîna b'husn û cemal

Çer dibêjin ger ku wer be guh bidê
Ji mir b'xwaze wê demê muhlet nedê"

Rabû ser xwe Fatîme zû meşîya
Li nav meznê wan Qureyşan gerîya

Kes nedî rindtir ewê j'qîza Weheb
Amîna rind a delala bi edeb

Pir delala nazik a çavê di reş
Ji Zuheyran torina qewmê Qureyş

Amîne sor û sipî,husn û cemal
Nayê gotin bi qelem bînim xiyal

Çi bibêjim pesnê wê j'bona me ye
Ne diya Peyxember e,çavê me ye

Fatîme dît û vegerya dil disot
Hate malê pesnê Amînê digot

Hatî Ebdulmuttelib rakir ji mal
Çû ji bav wê xwestî ew rinda delal:

Sed devê lok ê di girmil,sed dewar
Huqqekî zêr,huqqekî zîv bi jimar

Sed pezê qerqaş digel wan hatine
Tev didan next û qelendê Amîne

Berya îslamê evî tişt ê hebû
Qelend û nextê gelek heram nebû

Hatî Ebdulmuttelib wê saetê
Kir tedarek kar û bara dawetê

Dawetê dunya dida zewq û sefa
Daweta bavê Muhemmed Mustefa

Keyf û saz û zirne yû tillî-milî
Ketne govendê cuwan û hilhilî

Dawetê xelat belav kir li tevan
Hatne ser hev ehl û obê Ereban

Paşîya mehê ji payîza ewil
Çendî roj  mabû bikev Recebê j'dil

Xwarin û zad û te'am pir çêkirin
Herçî hatin şahîyê tev têr kirin

Amîne xemlandine kirne gul e
Hem hene l'destan e,çavan bi kil e

Eynî şeva duşemê nîkah kirin
Bûk û zava herduwan xelwet kirin

Di Mekê geryabû ev xweşgotin e:
"Ebdullah zava ye,bûk bû Amîne"

Bavê Amînê gelek keyfê dikir
Wê nûra mezin ji xwa nesîb dikir

Gelkî qîzê mezinan xwûn der kirin
Wan ji bona Ebdullah miraq kirin

Lewra wan zanibû dê tiştek bibe
Mirovek mezin ewê dê jê bibe

Eşkera bû nûra enya Ebdullah
Lew keçan bo wî digotin "ah û ah"

Bûk û zava herdu çûne xelwetê
Şahîyek xweş kefte baxê cenetê

Hate girtin derîyê agir temam
Teyr û heywanat li hev dane selam

Hor û xilman û çem û dar û beran
Ji Xweda ra tev û hev pesna didan

Rebbê alem emrê Cebraîl kirî
Wî bi bal heft asîmanan rêkirî

Cebraîl hat goti bo wan melekan
Xelqê asîmana gişkê felekan

Gote bo wan:"Hatî dewra Mehmedî
Hat resûlê fena wî çavan nedî"

Xulxule peydabû ket nav asîman
Dengê tesbîhê melek da Lamekan

Cebraîl(î) tevlû hinkî melekan
Hatne xwarê l'dora Beytê bûn sekan

Çar kenarê Beytê bûye zemzime
Dengê tesbîhê di wan kir gum-gume

Rast û çep deng dane hev Ruknê Herem
Ketne xwarê hûr dibûn pût û senem

Dengekî hatî ji Beyta Mezin e:
"Nûra Ehmed hatî çû nik Amîne"

Wê şevê tev padîşahan xewn didîn
Lat û pût (û) senem tevda qelibîn

Textê şeytanê le'în bû tar û mar
Hat l'ser çîyahê Qubeysî kir hewar

Zuryeta wî kom dibûn gotin:"Eman!
Ev çi hal e,bêje me?" wî gote wan:

"Pir li min çêbûye tirs û zelzele
Bi Muhemmed Amîne bû hamîle

Hatî dewra Muhemmed dewra me çû
Lat û 'uzza dê bibin bê av û rû

Hatî dewra Muhemmed dewra me çû
Senem û pût dê bibin bê av û rû

Hat ewê dunya bibe pê rind û pak
Em ji destê wî hemî bibne hilak

Ay!li halê me çewa be? ay û way!
Em şeytanê le'net lê ne,çi be ray?"

Ruhnîya çavê temamê ummetan
Ummeta wî çêtirînê j'ummetan

Ey cema'et tev û hev deng hûn bidin
Ser Resûlê xwe selatan pir bidin

Zarûk û kal û cuwan û mêr û jin
Salê carek hûn ji boy mewlûd bidin

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 11

## HEMLA HEZRETÎ AMÎNÊ BI HEZRETÎ MUHEMMEDses.

Amînê got:"Bû Muhemmed Mustefa
Min bi hemla wî nedî zor û cefa

Lê ku gava ez bi wî hemle dibûm
Pir keramatê mezin waqif dibûm

Min xwiyê şêrîn li xwe dîtin gelek
Enbîya û ewlîya tevlû melek

Tev dihatin xewna min pirsê dikin
Tev ji wê hemla mi ra nizmê dikin

Meha ewel hati Adem xweş kirî
Hem selam û merheba l'hemlê kirî

Ya diduwan hatî Şîsê xweşteba
Kir selam û gote hemlê 'merheba'

Ya sisîyan hati Idrîsê Nebî
Gote min 'mizgîn li vê hemla te bî'

Meha çaran,hati Nûh xweş kenîya:
'Hemla te şahê temamê enbîya'

Meha pênca Hûd digot xweş xeber e:
'Hemla te mizgîn didim peyxember e'

Meha şeşa hati Îbrahîmxelîl
Wî selam daye li vê hemla cemîl

Meha hefta hati Îsmaîl bi vî
Keyf û mizgînê dida min,peyivî.

Meha heyşta hati Mûsa bû wefa
Gotî:'Hemla te Muhemmed Mustefa'

Meha neha hati Îsa j'asîman
Daye mizgîn:'Hatî sultanê cîhan"

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 12

## WEFATA HEZRETÎ EBDULLAH BAVÊ PÊXEMBER

Piştî şeş meh çû ji wê hemla necîb
J'Ebdullah ra gotî Ebdulmuttelib:

-Ji bo tîcaret tê herî heta b'Şam
Ji Medînê bar bikî zad û te'am

-Nêz bûye bo Amînê godek bibî
B' eşîran lazime ziyafet bibî

Karîwan rabû tev û hev buhurîn
Mal birin Şamê firotin zivirîn

Hatin bajarê Medînê b'keyf û xweş
Ebdullah b'wan ra li wê bûye nexweş

Ebdullah xortê delal ê pir kibar
Di Medînê şerbeta mirin vexwar

Umrê Ebdullahî bîst û pênc-i best
Wî ji vê dunya genî xatir dixwest

Kariwan hatin bi mal tev gir û hûr
Çavê Amînê di maye l'rêka dûr

Amîne bûka delal a şeşmehî
Hêj bi mala bavê neçûbû zehî

Weqta Ebdulmuttelib ev îş kirî
Herdu çavê Amînê xwîn rêkirî

Şev û rojan "ax" girîn ê jê dihat
Hêstirê çavan wekî kanî dihat:

"Çewa roja me murad kir xweş dibû
Lê belê îro bi 'eksê reş dibû

Ka ezîzê min? dilê min bûye nîm
Ah û hesret,ma piçûkê min yetîm!

Ebdullahim ma ji xelqê karîwan
Tev bi keyf in,ez tenê ketme xeman

Destê me qetya ji hev,bû ebedî
Di dinê da me ji xwa têr hev nedî"

Dar û ber bo wê girîn wê saetê
J'hêstirê çavan ku nadnê muhletê

Hem melek rabûn û gotin:"Ya Kerîm
Ne hebîbê te Muhemmed ma yetîm!

Kerîm û qadir,rehîm navê te ye
Ev çi bû bo Amînê,bêje me ye?"

Xaliqê gişkan bo wan daye cewab:
"Çî bikim bo we bizanin ew sewab

Ew Muhemmed bav û dê qewm û kekin
Ha hebin,ha tunebin l'cem wî yek in

Lewra ew koka temamê alemê
Giş ji wî çêbûn,ji wî hatin dinê

Ew yetîm e,hikmetê wê pir hene
Hûn kitêbê wî binêrin çi hene"

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 13

## HATINA HEZRETÎ MUHEMMED LI DUNYAYÊ (Û) MERHEBATÎYA RUHAN JÊ RA

Ji rebî'ulewelê deh şev diçûn
Hemla Amînê temamî roj dibûn

Şeva yazda, zimzim û awaz û deng
Ketne nav Beyta Herem tesbîh û deng

Xelqê asîman bi erdê daketin
Dengê tesbîha b'çiya, erdê ketin

Şeva dozda, hat şemala dewletê
Amîne mabû tenê d'wê xelwetê

Meha nîsanê şeva bîst û dido
Ji rebî'ulewelê deh û dido

Wê şevê Ebdulmuttelib çêdikir
Cîyê xirabe Beyt wî ava dikir

Gotî Ebdulmuttelib:"Nêzî seher
Min didî zimzim kete Ruknê Hecer

Deng dida 'Ellahû ekber' jê dihat
'Hatî dunyayê Muhemmed esselat'

Ke'be şûştin wan temam b'misk û gulav
Hem bi tekbîr û selatan dane nav

Hundirê Beytê şemal û nûr dibûn
Lat û pût tev ketne xwarê hûr dibûn

Dengê tesbîhê melek çûn Lamekan
Min li dora xwe nihêrt mam bê ziman:

'Ey gelo îşev qîyamet radibe?
Çi 'ecêb e ev bi Beytê wa dibe?'

Ez ji vê tirsam û bazdame bi der
Min didî dunya temam nûr daye ser

Hate min dengek:'Eya meznê Meke
B'Amînê kurkî Xwedê da, keyf bike!

Ev şemal û deng û reng bona wî ye
Mekeve tirsê bikev keyfa xwe ye"

Em werin bo Amînê behsê bikin
Bo hebîbê xwe gelek pirsê bikin

Amînê got:"Mam tenê bê mêr û jin
Ez demek lerzam û tirsek hate min

Ebdullah nîne bikim jê gazinan
Kes tune gazî bike çend heb jinan

Min dî xanî ruhnî bû xayet belê
Çar-i jin hatin ji rukhê menzilê

Pir cemal û xweşik û rindî hebû
Kincê ser wan, ne ji vê dunya me bû

Lêvê wan têr bûn ji ava Kewserê
Biskê wan sed pîn didane 'enberê

Zarê wan xweş bû wekî şekerqulat
Bihna firdewsê ji lêvê wan dihat

Bejn û bal û seruçavê wan şefaf
Min şubhandin j'torinê Ebdulmenaf

Yek li alê rastê hat û yek li çep
Yek li pişt û yek li pêş min bi edeb

Kenîyan tevhev bi min keyfxweş dibûn
Hundirê odam temam bihnxweş dibûn

Ew kî bûn bo we bibêjim wan temam
Bûne pîrik j'bo Muhemmed we sselam:

Ya li pey min hezretî Hewa dibû
Ya li pêş min Meryema Îmran dibû

L'alê rastê Sara Îbrahîm dihat
L'alê çepê Asîya Fîr'ewn dihat

Meryemê rindîya wê j'wan zêde bû
Palvedabû ew ji bo min hêde bû

Wan jinan b'hev ra didan tesbîh û deng
Min didî l'dora min nûr hat reng û reng

Çar teref min dî li min dunya bû nûr
Meşriq û Mexrib didîtin min ji dûr

Min didî dunya bû wekî sêvekê
Hate ber min kete pencê teyrekê

Ref-refê teyran li min hatin melek
Wan bi hev re xweş didan tesbîh gelek

Erd û esmanan bi hev ra daye deng
Her teref dunya li min bû reng û reng

Dengê zikr û tesbîhan min şaş kirin
Min di nava behrê nûrê werkirin

Min didî ez tihnî bûm wê saetê
Yekê da destê min tasek şerbetê

Sipî wek şîr û şeker e bû bi min
Min vexwarî tihnî çû fîlhal ji min

Min dî teyrek sipî hatî xweş dixwand
Wê perê xwe daye pişta min gerand

Tirs û êş û elemê zik radibû
Hew min dîtî ku li min xweş çêdibû

Hate dunyayê Muhemmed Mustefa
Nûra çava, kanîya sidq û sefa

Dengekî b'dunyayê ket tevda hejî
Çi mirî yû çi we sax û çi bijî

Ruhê wan rabûn piya dane seda
Kirne gazî b'hev ra gotin:'Merheba!

Merheba b'xêr hatî ser çavê me ra
Merheba b'saya te em bûne bira

Merheba tu yê bi xêr hatî dinê
Merheba îmdada me pişt mirinê

Merheba pêxemberê îslamê hat
Merheba rehberê vê alemê hat

Merheba hatî şivanê ummetê
Merheba hat bo me nûra qudretê

Merheba alem bi te bûye xenî
Merheba dunya bi te bû medenî

Merheba hat ê ku zulmê rabike
Merheba hat ê feqîran şa bike

Merheba ê j'ruhê me pirtir li pêş
Merheba j'xelqê ketî ra destekêş

Merheba ey ruhnîya vê ummetê
Merheba ey sebra me b'navê te tê

Merheba ey nûra erd û asîman
Merheba ey şahîya derd û xeman

Merheba ey mana Quranê tu yî
Merheba ey sirrê însanî tu yî

Merheba sultanê gişkê enbîya
Merheba ey kanîya giş ewlîya"

Ey Muhemmed em bi heyrana te ne
Bi mal û canê xwe b'qurbana te ne

Alema îslamê tevda ku heye
Giş minetkarê evî dînê te ye

Roja heşrê em bi bal te dê werin
Bi ceneta e'la b' saya te herin

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 14

## HATINA HEZRETÎ MUHEMMED A DINYAYÊ DÎTINA AMÎNÊ Û KERAMATAN

Hate xwarê secde bir zikrê dikir
Ser helanî l'asîman mêze dikir

Amînê got:"Min ji wî gazî nedî
Wek kurê xelqê şil û tazî nedî

Ew çewa hate bi erdê secde kir
Perçekî ewrê sipî wî perde kir

Wan jinan rabûn û hilgirt û diçûn
Wî delalê min birin wenda dibûn

Piştra hanîn pêçek û şûşt û temîz
Herdu çavê wî b'kilê bûne 'ezîz

Tiştekî sipî di nav destê wî bû
Ew bi wî tiştî ji xwa mijî dibû

Dengekî hatî ji xeybê da der e:
'Girtî nûra wî dinê behr û ber e

Pir mubarek be ji bo te Amîne
Me li cem xwe nav Muhemmed danîne

Weqta hat şîrdayînê tu b'kes nedî
Lê b'Helîma Sadîyê bes tu bidî'

Min ji destê wan jinan girt û disand
Herdu çavê min grî hêstirkan rijand

Lewra vî şekl û sîmayê pir bedî
Min ewî d'nav çavê Ebdullah didî

Hate bîra min ewê xort ê mirî
Herdu çavê min tijîbûne girî

Min dî çavê xwe vekir b'min ra kenî
Ez ji bihna misk û 'enber bûm xenî

Gotî:'Dayê bes tu bikşîne keder
Tu bi min çavan veke bihna xwe der'

Min himêz kir şîr dida wî şekerî
Gav dixwar û gav bi min ra bişirî

Hatî Ebdulmuttelib bo dîtinê
Min dî yek mrovê dirêj yê wê dinê

Wî bi Ebdulmuttelib kir galegal:
'Heta sê rojan tu nayî ber bi mal

Xelqê asîman bi erdê daketin
Dê evan rojan zîyaret bikitin

Piştî sê rojan were tu wî bibîn
Torinê nazik, xweyê dînê mubîn"

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

## BEŞ 15

### HATINA HEZRETÎ MUHEMMED DUNYAYÊ Û NÎŞANDAYÎNA 'ECÊBA

Ew şeva ku hate dunyayê temam
Lej û hejek hate dunya bû xumam

Qeyser û Kisra ji ser texta ketin
Qesr û qûnaxê di wan tev daketin

Agirê Faris vemirya-tefîya
Eywana Kisra li Bexda teqîya

Behra Sawe j'nişkava da bû zuwa
Bi sema, çola zuwa av kişîya

Remledar û rahib tev b'tirsê ketin
Xaqan û Kisra di wê pirsê ketin

Li Meşriq û Mexrib b'şev rabû şemal
Şewq û rengek hate vê dunya zelal

J'istêrkê asman temaman nûr rijî
L'ser rûyê erdê melek bûne tijî

Bû wekî cennet evê dunya genî
J'rehmetê sax û mirî bûne xenî

Pir keramatê mezin hatin der e
Aliman zanîn ku hat Pêxember e

Wê sibê yahûdîyek hat û gerî
Ket kuça, wî mal bi mal pirsê kirî:

"Ey gelo îşev li vir kurkî bûye
Ew kurik peyxember e, bo kê bûye?

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 16

## BEHSA ŞÎRDAYÎNA HELÎMÊ JI BO HEZRETÎ MUHEMMEDses.

Du mehan şîrê xwe da pê Amînê
Hate weqta ku bidin şîrdayînê

Wê qebîla SADÎYAN ehlê çîyan
Weqta germê tên Mekê bo sebîyan

Bi heq d'bin ehlê çîyan wan sebîyan
Lê dinêrin, ta sebî rabin pîyan

Hem li zozanê di wan zû gir dibin
Xalisê zmanê Ereb zû hîn dibin

Ew qebîla Sadîyan tev hatine
Mêr û jin tevda bi Mekê ketine

Hatin nik Ebdulmuttelib jin gelek
Wî bi yekê nîşanda çavê belek

Hatî ber derî jinek pirsê kirye
Gotî:"Navê min Helîma Sadî ye"

Jê ra gotin:"Ey Helîme tu were
Em bidin te torinê wek şeker e

Ey Helîme hilgire pakê temîz
Li dinê, axretê tev bûyî 'ezîz

Xwezila me bi te tê(tî) pirê car
Li dinê wek Muhemmed şîrê te xwar"

Helîmê pêsîr dida wî şekerî
Hem vexwarî hem bi wê ra bişirî

Bişirî nûrek mezin rabû j'enî
Bihna xweş daye Helîmê sekinî

Got Helîmê:"Ez bi heyrana te me
Ez ji vê nûra te êsîra te me"

Heta çar sala Helîmê bir ewî
Qewmê Se'dî bûne maldarê bi wî

Sala paşî l'cem Helîmê bû şivan
Tev birayê şîr, pezê xwe bir çêran

Hikmeta Xaliq ji bo wî rehberî
Bû şivanî layîqê peyxemberî

Rojekê hatî birayê şîr bi xar
L'qewmê Sadî, ber bi malê, kir hewar:

"Du mirov hatin Muhemmed wan birin
Ez nizanim wan birayê-m çi kirin"

Qewmê Sadî bi hewar tev çûne wî
Lê Helîmê berî gişkan gîşte wî

Got:"Mi dî rûniştî ye palda kenî
Kesk û sor û şûle nûrê tê j'enî:

Ey kurê min ev kî bûn hat û birin?
Te revandin hanîne vir çi kirin?'

Gotî:"Dayê du mirovê ne ji vir
Bi destê min girtin, min hanîne l'vir

Nazik û nûr û sîmayê wan delal
Dest û pêçî, gerden wek ava zelal

Min li vir danîn, û kêr û meqesan
Legen û mesîn û cûzan û hesan

Wan zik û singê-m temamî qelişand
Qelbê min derxistin û wan herişand

Nuqtekî reş jê helanîn û birîn
Gotin: EVYA CÎYÊ ŞEYTANÊ LE'ÎN

ME JÊ AVÊTÎ EY LAWIKÊ GIRAN
DÊ BIBÎ TU PAŞÎYA PÊXEMBERAN

Hundirê qelbê-m tijî wan nûr kirin
Hem ji bo pêxemberîtî muhr kirin

Wan dirûtin qelb û singê min temam
Hem firîn çûn û li min kirne selam"

Qewmê Sadî şaş dibûn j'vê gotinê:
'Ey Helîme  wî bibe cem Kahinî

Dê kurê xelqê li cem me dîn bibe
Şermezar bin em li cem wan, zû bibe"

Helîme rabû Muhemmed kir suwar
Wê bibe cem Kahinê pir ixtîyar

Ketne rê çûn û ji Konan dûr dibûn
Hem b'keramatê mezin mijûl dibûn

Dît Helîme  jineke b'qêrîn û xar
Hem li xwe d'xe, hem li xelqê d'ke hewar

Got Helîmê:"Te çi derd e vê demê?"
Got:"Kurê min ketye bîrê, nagîmê!

’Umrê min pêncî ye, keskî min nebû
Yek kurê min bû, umûda min ew bû

Ew jî ket vir xeniqî av da ser e
Destê min nagîjê ez bînim der e".

"Min Muhemmed hanî û gotê: ’were
Ger keramatsahib î, bîne der e!’

Min (dî) destê xwe dirêj kir ba Xweda
Herdu destê xwe di ser çavê xwe da

Tilîya xwe kir îşaret wî bi av
Av kelî rakirye dûman û xunav

Tijî bû ew av ji bîrê rijîya
Lawkê pîrê hate der, rabû pîya"

Ey Muhemmed em bi heyrana te ne
Gişkî xelqê aleman l’benda te ne

Tu ji gişkê aleman ra rehber î
Qurskî nûr î tevuhev peyxember î

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 17

## QALA ŞIVANÎYA HEZRETÎ MUHEMMED BIRAYÊ (WÎ YÊ) ŞÎR Û KERAMATAN

Pey keramatê mezin bûye xuya
Helîmê wî kir hemêzê girîya

Got:"Bi qurbana te me ey berxê min
Em biçin ber Kahinê pîr ê mezin

Dê ji bona te xeberkî xweş bibêj
Herdu çavê xwe ji bona te birêj"

Wî bire ber Kahinî, tev jê re got
Wan keramatê ku dîtî pê re got

Kahinî girt û li wî mêzekirî
Nîşanê peyxemberî wî naskirî

Kir hemêza xwe bo wî kirye hewar
Deng dida qewmê şerûd ê pir xedar:

" Yê ku em lê digerin wernê ev e
Bikujin hûn min û wî tevlûhev e

Dînê me dê bi vîya dê be hilak
Bikujin hûn min û wî, em bibne pak".

"Qewmê wî hemyan bi hev dane hewar
Hatne ser me l'destê wan da şûr û dar

Nêzî me bûn rakirin toz û dûman
Lê Muhemmed yek nezer da asîman

Qêrîn û toz û dûmanek radibû
Qewmê Kahin kes nedîtî pê çi bû

Min dî yek mervê dirêj î pir kibar
Pîn li Kahin da di erdê kirye xwar

Gote min:'Rabe Helîme zû bike
Wî bibe teslîmê Bapîrî bike"

Pir keramatê mezin bûne xuyan
Qewmê Sadî tevuhev pê hesîyan:

Rojekê la(w)ê Helîmê kevirek
Li çaqa pez da şkestî kirye kulek

Pez dihatî hem dikirî "beh"û"qîj"
L'cem Muhemmed vezilî nik kir dirêj

Wî digirt çaqa wê destê-x tê dida
Nig rehet bû, rabû ser xwe bazdida

Got birayê şîr:"Tu bo çi wa dikî?
Bêziman in, bo çi wan teda dikî?

Ev heywan zar û zimanê wan tune
Teslimê însaf û wucdana te ne"

"Rojekê pez çû newala cnawira
Min vegerandî ji tirsa lahwira

Gote min:'Bêle bila pez biçêre
Meke qet tirsê tu serbest bigere'

Min dî şêrek l'nav Newalê digerî
Çavî sor bû, ew bi ser me zivirî

Heşê min j'tirsana bû tevluhev e
Min digot:'Paşîya 'umrê min ev e'

Wî Muhemmed dît û dûvî şindilî
Kûstekûst û hate ber wî vezilî

Bi guhî girt û du gotin kirye van
Şêrî rabû hem ji pez ra bû şivan."

Pir ecayîbê mezin bûne xwîyan
Xelqê wan doran temam pê hesîyan

Dengekî gote Helîmê:"Zû bike
Wî bibe teslîmê Bapîrê bike"

Helîme rabû Muhemmed kir suwar
Sefera rêka Mekê j'xwa kirne kar

Ketne rê çûn û ji malan dûr dibûn
Hem b'keramatê mezin mijûl dibûn

Dît Helîmê l'dora wan xweş deng dihat:
"Hem li ser navê Muhemmed d'kin selat

Xweşkelam û şi'rikan b'hev ra dibên
Pesnê vî pêxemberê b'min ra dibên

Min Muhemmed l' serê rê da sekinand
Çavê xwe l'dor û derê xwe pir gerand

Kes xwîya nake bibînim, lê belê
Dengê wan işqa dilê min da kelê:

'Ey kurê min ev çi deng e bi me tê
Me dike cezbe li ser navê te tê?'

Kenîya hûrik di ber xwe bişirî
Şewq û nûrê kon li ser me vekirî

Min didî l'dora me tev bû reng û reng
Zikr û tesbîhan li me rakirye deng:

'Ey gelo ev kî ne, îro çi dikin?
Dê di vê rêkê, me îro dîn bikin!'

Min Muhemmed sekinand çûm (û) gerîm
Nav Newalê kes nedîtî zivirîm

Hatim cihê xwe, Muhemmed lê tune
Giryam û min gotî:'Heywax li min e!

Sihirbaz û rêbiran hat û birin
Ez nizanim wan kurê min çikirin'

B' rêwî yû cotkariya min pirs dida
Lê belê keskî ji ma salix neda

Ez diçûm ber kahinekî rîsipî
Derdê xwe min gotê, zêrek dayî pê:

'Ey Helîme navê lawkê te çî ye?'
Min digot:'Navê Muhemmed lê bûye!'

Kahinî remla xwe danî hinzizî
Behsa navê wî kirî pir lerizî

Got Helîmê ra:'Tu rabe j'vir here
Behsa navê wî dilê-m xwîn d'ke der e

Lewra ew dê vî dînê me rabike
Senem û pûtan j'dinê wenda bike

Tu şukur bike ku ew wenda bûye
Gişkê alemê ji wî xilas bûye'

Ez ji wê hatim girîm û ustuxwar
Min berê xwe da Mekê b'lez û bi xar

Çûme cem Ebdulmuttelib dil disot
Herçî min dîtî, temam jê ra digot

Gote bo min:'Ya Helîm kitmê bike
Tu li cem Amînê vê behsê meke

Amîna min dilhezîn e tew meke
Derdê kezebê ji wê ra vemeke

Rabe ez û tu bi hev ra lez bikin
Biçne Beytê em li wê du'a bikin

Belkî Rebbê alemê nîşan bide
Qelbê Amînê teze b'derdan nede'

Piştî heft caran tewafê me dida
Ketne Beytê me berê xwe da Xweda

Gazîya torinê Ebdulmuttelib
Bi Xweda da me digotî:'Ya Hebîb!

Ew Muhemmed li kû ye, nîşan bide
Alimê xeybê tu yî j'me ra bide'

Deng dida Beytê dikirî gumegum
Got:'Melaîket li doray bûne kom

Way li bin dara Yemamê, hûn herin
Wî bibînin, bes li wî hûn bigerin'

Çav û qelbê me j'girînê sekinî
Rûyê Ebdulmuttelib xweş bû kenî

Em diçûn bin Darê way rûniştî ye
Gotê Ebdulmuttelib:'Te nav çî ye?'

Gotê:'Kalo bo çi tu d'pirsî bi lez?
Ez Muhemmed kurê Ebdullah im ez'

Ji devê Ebdulmuttelib xû dikir
Girtî kula xwe hemêzê wî dikir

Gotê Ebdulmuttelib:'Ez ku heme
Mezinê Mekkê bi xwe kalê te me'

Çûye destê kalê xwe, em radibûn
Hatne malê tevuhev em şa dibûn"

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

## BEŞ 18

### GIHÎŞTANDINA HEZRETÎ MUHEMMED BI DIYA WÎ Û YETÎMMAYÎNA WÎses.

Amînê gava bi wî da çav dida
Hem girîn û hem kenîn pê ra dida:

"Ji nuha pêşda tu dayê keyf bike
Dê ezê l'cem te bibim, miraq meke"

Amîne rabû Helîme razî kir
Gelkî tiştan daye pê, wê b'rê dikir

Wê gavê Muhemmed b'xwe çar salî bû
Ma li cem dêka xwe, ew pê şa dibû

Piştî du salan wî girtî Amînê
Bir nîşan da xalanê wî l'Medînê

Gelkî îkrama bi xwarzê xwe kirin
Pir bi keyf û şahîyê wan b' rê kirin

Nêzî Medînê mezelê bavê wî
Amînê girt û bir û serdaye wî

Ew jî wekî bavê wî çû j'vê dinê
Li wê wefat kir Muhemmed ma b'tenê

Bû yetîmê j'dê û bavan ew kubar
Hêstirê çavê wî jorda kirne xwar

B'hesreta diya xwe bû, wî têr nedî
Zarikê şeş salî bû, ma bêxwedî

Carîya Amînê ya pê ra çûye
Bû diya wî, hanî cem kalê wî ye

Gelkî îkram dayê Ebdulmuttelib
Girtî ber xwe torinê rind î necîb

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 19

## GIRTINA EBDULMUTTELIB TORINÊ XWE (DI) PEYRA EBÛTALIB BIRAZÎYÊ XWE

Dozde salî bû mezin l'cem kalê xwe
Kal nexweş ket gazî kir lawanê xwe:

"Muhemmedê min qenc binêre l'apan
Ji mir bibêje, hes dikî tu kî j'wan?

Piştî min ra, lê bikim temîna te
Te bibe cem xwe, bibe wek bavê te"

Bona kalê xwe Muhemmed negot tişt
Çû di pêşa Ebûtalib rûdinişt

Keyfa Ebdulmuttelib pir çê dibe
Wî gelek tenbîh d'da Ebîtalib e

Ebûtalib pir bi wî kir îftîxar
Ramîsanda herdu çavê wî du car

Sêzde lawê Ebdulmuttelib hebû
Ebûtalib mezinê hemyan dibû

Heta 'umrê wî çil û heyşt dîtîye
Ebûtalib lê hîmayet kirîye

Sîzde salî bû, vî apê wî dibir
B'alê Şamê pê tîcaret hîn dikir

Weqta germê hate ser wî sî-xumam
Rahibekî nêzî Şamê dî nemam

Fam kirî ku ew nebîyê axir e
Sufrekî xweş j'wan ra wî kir hazir e

Got:"Ebûtalib, ji vir tu bizvire
Meçe Şamê l'wê neyarê wî pir e"

Rahib û qewmê wî, malê wan kirîn
Gişkî rabûn ber bi malê zivirîn

Pir keramatê mezin b'derve dikir
Lew Ebûtalib ji wî pir hes dikir

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 2O

## ZEWACA HEZRETÎ MUHEMMED Û PÊXEMBERÎYA WÎ DIGEL WEFATÊ

B'umrê wî da hatî bîst û pênc-i sal
Bi Xedîcê zewicî bû xwedyê mal

Ji Xedîcê du law û çar qîz bûye
Îbrahîm wê ji Marya Qubtî bûye

Sih û neh salî li 'umrê wî tebat
Bi tenêtî daîma lê xweş dihat

Piştî şeş meh perda qelbê wî bû felq
Ruhnîya rehma Xweda lê da şefeq

Di Şikeftê bitenê ma şeş mehan
Wek sibe ruhnî dihat qelb û dilan

Roja 'umrê wî temam çil kir ava
Fexrê alem bû ji bona me teva

Ruhnîya qelbê wî paşê bû temam
Melekê wehyê li wî kirye selam

Derîyê rehmetê pê da vekirin
Hat û Cebraîl bi wî da hînkirin

Dengê Quranê dida vê alemê
Sûreyê "Îqre" dida ber qelemê

Piştî sê sal, lê nebîtî bû temam
Bû resûl, pêxemberê alîmeqam

Hat û Cibraîl digotê wê demê:
"Ey Muhemmed rabe bêje alemê

Ji cenet û dojê temam behsê bike
Alemê d'xew da temam hişyar bike"

Bîst û sê salan ji bona me Hemîd
Ders dida me wî ji Qurana Mecîd

Pir cefa û zehmetê gelkî zeman
Pê didane qewmê pût û seneman

Mucîzatê pir mezin jê dîtine
Kafiran lê pir 'înadê kirine

Ehlê îmanê b'dizîtî bûn bira
Hate îmanê 'Umer kir eşkera

Ji ber cefa w zehmetê tev radibûn
Bi Medînê da muhacir tev dibûn

Ehlê îmanê li wê tev bûne kom
Ji Medînê deng dida Ecem û Rom

Bîst û neh herban Ereban pê dikir
Lê Xweda daîm bi nusret şa dikir

Piştî van herban temam bûne wefa
Deng dida dînê Muhemmed Mustefa

Mezinê Rom û Ecem pir hatine
Wê dema dîn û zîyaret kirine

'Umrê şêst û sisiyê hatibû wî
Bîst û neh ta, ji riyê wî bûn sipî

B' sed û bîst û çar hezar mumin bira
Hat Mekê wî kir tewafa xatira

Paşya Quranê li vir bûye temam
Hat û Cebraîl li wî kirye selam

Hat Medînê nava wan ehbabê xwe
Hanî ser hev gişkî, wan eshabê xwe

Pir nesîhetkî mezin wî daye wan
Bo wefata xwe îşaret daye wan

Hinkê eshaba ji wî fam kir, girîn:
"Dê ji nav me biçit Muhemmed emîn"

Piştî sê mehan li wê bûye nexweş
Hatî Eshabê Kîram, rojê di reş

Sêzde rojan di livînê da dibû
Roj bi rojê her diçû zêde dibû

Sê rojên paşîn bo Ebûbekir e
Emrê wî kir, wî limêjê dikire

Duşemê rojê ku daye vê demê
Girîn û şînê dida vê alemê

Şênîka ehlê Medînê zivirî
Hûrik û giran tevhevdinê kirî

Çû ji dunyayê Muhemmedê emîn
Bi musulmana bûye şîn û girîn

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 21

## PESINDAYÎNA MUELLIFÎ JI BO Hz. MUHEMMED BI QELEMA IŞQÊ

Çûndina Peyxemberê me l'Medînê
Ummeta wî kir yetîmê vê dinê

Ey Muhemmed em bi heyrana te ne
Bi mal, canê xwe b'qurbana te ne

Cahilîtî te ji dunya radikir
Çavê kor bû, wê bi te îman nekir

Şewitîm d'işqa te da tim û tim e
Kes nizanit ez di vî halî çi me

Lem'a nûra te dida vê alemê
Her serê deyşt û çîya da riqemê

Şemla nûra te li min daye lefa
Ey şêrînê min Muhemmed Mustefa

Enbîya û ewlîya çiqas hene
Tev gemî ne way li ser behra te ne

Azayê canê min tev da ku heye
Tev dinale way di nav işqa te ye

Feyza işqa te di nava her dilan
Her serê deyş û çîyan şînê kulan

Bi heqîqet tu neçûyî j'vê dinê
Lê belê husna te rengdawî dinê

Ji pêşya husna te, sî bûn şermikar
Lew xuya nedbûn li ber tavê tucar

Bû hezar û heyştê yû çar sêsed e
Şerha navê te dibêjin naqede

J'ehlê ilmê ra temam ev kafî ye
Mucîza peyxemberî meznatî ye

Roj û şev hetta li me bêt û here
Lem'a nûra te di qelban digere

Ehlê îmanê li dor ê bicivin
Dujminê dînê te dê j'hev bikevin

Qalibê herfa kîtaba alemê
Mushefa singê te bû da vê dinê

Sed û bîst û çar hezar peyxember in
Giş ji bona alemê ra rehber in

Paşîya gişkê evan peyxemberan
Baştirê wana tu yî bo beşeran

Alema îmanê tevda ku hene
Çavê wan hemya li wê şef'a we ne

Ya Rebî tu me 'efû kî tevluhev
L'dor hebîbê te Muhemmed bibne sef

Seydayê Batê digel vî Zahidî
Pesnê Mewlûdê bi Kurmancî didî

Paşya Mewlûdê li vir bûye temam
J'haziran ra em dibêjin esselam

Ger dixwazin hûn xilas bin ji agir
Selewatan bînin civata hazir

# BEŞ 22

## DU'AKIRINA MEWLÛDÊ JI BO CIVATÊ Û GIŞKAN RA

Ey cema'et tevuhev dest hûn vekin
Em bibêjin hûn li vir "amîn" bikin

Ey resûlellah resûlê Qureyşî
Ey hebîbê weku nûr jê dikişî

Tu şefa'et ke ji bona me gişan
Me gunehkar û feqîr û bêkesan

Em di dunyayê feqîr û bêkes in
Pir zelûl û ustuxwar û bêkes in

Tu, umûda me di dunya w axretê
Me xilas kî tu ji zor û zehmetê

Herçîyê pêgirtî yê te ku hene
Hêvîdarê dîtina bejna te ne

Pira Sîratê dibêjin ku heye
Dehşetek zor e li pêşîya me ye

Mehşer û hîsab û Mîzan ku hene
Teşqelê pir mezin in bona me ne

L'pey vana agirê zor ê cehnemê
Qet xilas nabe ji wî kes wê demê

'Ezabê qebrê digel ruhsendinê
Tev cefayê l'pêşîya me l'wê dinê

Hêvîya me her ev e b'bal te werin
J'wan neqebê zor xilas bin em herin

Me bidî pêşyax bibî wê cenetê
Şewq û nûra te bide ser umetê

Ya îlahî benîadem ku hene
Tev gunehkar in, hemî qûlê te ne

Tu yê rehma xwe bidî ser alemê
Giş xilas kî ji 'ezab û elemê

Cihê qehr û xezeba te ku heye
Em nizanin ayidê zatê te ye

Tişkî kêm nabe bidî tev rehmetê
Wan bi fezla xwe bişînî cenetê

'Efwa 'am nêkarîya meznatî ye
Zatê pir têrî we layîqê wî ye

Ey cema'et tevuhev bêjin "amîn"
Em bikevin pêşya Muhemmed emîn

Ewlîya û 'alimê vê umetê
Tev şefe'dar bin ji bona vê xetê

Serfiraz bin em di nav giş umetan
Tev Resûlê xwe biçin em cenetan

Herçî mayî j'umetê xelqê berê
Fezl û îhsanê birêjî li serê

Ewlîya û sofîyan û 'aliman
Hecîyan û peyrikan û cahilan

Herçî borîn, herçî bêtin, çi hene
Tevuhev muhtacê wê rehma te ne

'Alema Îslamê tevhev şa bikî
Wan bi Quran û bi îman rêbikî

Jê ewel, bêjin ji bo pêxember e
Piştra al û eshaban bidne ber e

Yê dido, bo ewlîya û 'aliman
Şehîdan û xazîyan û sofîyan

Yê sisê, bo hecîyan û cahilan
Qîz û xort û pîrekan û sebîyan

Yê çaran, bo vê civata hazir e
Tev xweyê nanê ku Mewlûd li ser e

Yê pêncan, seydayê BATÊ ku heye
Tev mela ZAHID melê xelqê me ye

J'bo mirî û zindîyan jî tev bikin
Fathekê hûn ji me ra îhsan bikin

Mewlûda HERDUBATê (wê) qedîya
Rehmet li cma'et û sax û mirîya

# NAVEROK


Pêşgotin . . . . . . . . . . 5
Beş -1 . . . . . . . . . . 7
Beş -2 . . . . . . . . . . 9
Beş -3 . . . . . . . . . . 12
Beş -4 . . . . . . . . . . 15
Beş -5 . . . . . . . . . . 18
Beş -6 . . . . . . . . . . 21
Beş -7 . . . . . . . . . . 26
Beş -8 . . . . . . . . . . 28
Beş -9 . . . . . . . . . . 32
Beş -10 . . . . . . . . . . 34
Beş -11 . . . . . . . . . . 39
Beş -12 . . . . . . . . . . 41
Beş -13 . . . . . . . . . . 43
Beş -14 . . . . . . . . . . 48
Beş -15 . . . . . . . . . . 50
Beş -16 . . . . . . . . . . 52
Beş -17 . . . . . . . . . . 56
Beş -18 . . . . . . . . . . 62
Beş -19 . . . . . . . . . . 64
Beş -20 . . . . . . . . . . 66
Beş -21 . . . . . . . . . . 69
Beş -22 . . . . . . . . . . 71




Weşanên Apec-Tryck & Förlag